Şeytanê bîbext

Yê gawanig gay bird e rê çemenzarê ta le ûra lewerrnê, u dûwa le xuda kird ta hürê e mil gagey bêd.

Şeytan erê xwey le naw geweL nişţî u dûway gawane jinewist u we xwey wet:

-"Her gil çişţig aqiwetê xêre î aymele şukri xuda eken; Er aqiwet çişţê gen bü bextê eken e me!"

Düya çen rûjig gage rê gum kird u çiqya naw xerig. Wextê gawane gagey dî e wa wet: -"Binüre ye! Bercid ye kar şeytane!"

Şeytan wet:

-"He û cûre ke wetim dirat".

Gawane çü çen neferê wel xwey bîyerê ta desmêti biden gage le xerig bîyerinê ew der. He gawane çü şeytan le geweL hat ew der u gage le naw xerig erawird ew der. Şeytan we bawer ye bü ke eger desmêt gawane bidad, yeme memnûn xwey edê.

Imca wextê gawane dî gagey le xerig eratges ew der wet:

"Xudaya şukr, gage le xerig erat ew der!"

Seywan Qember (www.feyli.se)